| | Alîkariya Hiqûqî / Baro | Rêveberiya Perwerdehiya Neteweyî ya Parêzgehê | Rêveberiya Îdareya Koçberiyê | AFAD | Wezareta Malbat û Polîtîkayên Civakî | Şaredarî |
|---|---|---|---|---|---|---|
| Eynteb | Baroya Eyntebê: 3422306372<br><br>Cadeya İstasyonê, Saraya Tîcaretê. Qat: 2 Şahînbey | 0342 -<br>231 10 58 | 0342 -<br>215 01 81 | 0342 -<br>336 26 92 | 0342 -<br>231 65 21 | 0342 –<br>211 12 00 |
| Êlih | Baroya Êlihê: 4882139552<br><br>Cadeya Av. Zekerîya Aydin, Koşka Nû ya Hikumetê, B Blok, Qat: 1, No: 206 Batman | 0488 -<br>280 72 00 | 0488 -<br>213 24 72 | 0488 -<br>213 91 33 | 0488 -<br>214 27 42 | 0488 -<br>213-27-59 |
| Amed | Baroya Amedê: 4122244441<br><br>Cadeya Elazîz, Seraya Edaletê ya Amedê, Qat: 4/263, Yenîşehîr | 0412 -<br>226-58-50 | 0412 -<br>229 06 08 | 0412 -<br>228 54 09 | 0412 -<br>224 38 26 | 0412 -<br>229 48 80 |
| Hatay | Baroya Hatayê: 3262151877<br><br>Seraya Edaletê ya Hatayê, Qata Zemîn, Antakya | 0326 -<br>227 68 68 | 0326 -<br>234 59 30 | 0326 -<br>216 10 67 | 0326 -<br>216 10 89 | 0326 -<br>214 91 90 |
| Kilis | Baroya Kîlîsê: 3262151877<br><br>Şehîd Sakip, Meydana Cumhurîyetê, Cadeya Cumhurîyetê, 79000, Kîlîs | 0348 -<br>813 40 52 | 0348 -<br>813 20 94 | 0348 -<br>813 44 78 | 0348 -<br>813 25 48 | 0348 -<br>813 10 10 |
| Mêrdîn | Baroya Mêrdînê: 4822136043<br><br>Taxa 13 Mart, Paş Muftîtiya Wîlayetê, Kolana 48an, No: 8 | 0482 -<br>212 12 58 | 0482 -<br>213 47 66 | 0482 -<br>212 37 72 | 0482 -<br>212 37 95 | 0482 -<br>212 10 49 |
| Ruhay | Baroya Ruhayê: 4143147001<br><br>Seraya Nû ya Edliyeyê, Qat:3 | 0414 -<br>318 85 00 | 0414 -<br>313 54 01 | 0414 -<br>314 08 52 | 0414 -<br>313 11 61 | 0414 -<br>318 51 00 |

# Rêxistinên Civaka Sîvîl ku li Herêmê Alîkariyê Didin

**Weqfa Bulbulzadeyê: 3422314694, Eynteb**

**Danish Refugee Council https://drc.dk/**

**Komeleya Welatiyên Helsinkiyê û MSF (Bijîşkên Sînonernenas)**
**Taxa Muslumanbey, Kolana Bayram Yerî. No: 31/1 Kîlîs / Nexweşxane**

**Komeleya Welatiyên Helsinkiyê: 2163362262 / Stenbol (Ruha-Hatay)**

**International Middle East Peace Research Center (IMPR) www.impr.org.tr 3122877010 / Ruha**

**International Medical Corps (IMC)**
**https://internationalmedicalcorps.org/**

**Çanda Kirkayak 342307454 / Eyntab**

**Komeleya Alîkarî û Hevkariya Rojavayê: 4122291786 / Amed**

**Komeleya Hevkariya Bi Penaber û Koçberan re (SGDD-ASAM)**
**http://www.sgdd.org.tr/ 3423236332 / Eyntab; 4825020105 / Mêrdîn; 4143135466 / Ruha**

**Weqfa Alîkariya Mirovî û Pêşketinê ya Navneteweyî ya Mavi Hilal: 2163841486 / Stenbol (Kîlîs)**

# Penaberên ku di Çarçoveya Parastina Navneteweyî de ne

Ew kesên ku ji derveyî Suriyê tên nav Tirkiyê pêgirê wan pênaseyan e ku di Yasaya Biyanî û Parastina Navneteweyî ya hejmara 6458an de hatiye nîşandan. Ji bo ku li welatekî sêyem werin bicihkirin ew dikarin Parastina Navneteweyî dawa bikin. Hûn dikarin dawakariya Parastina (penaberî) Navneteweyî li Rêveberiya Wîlayeta ya İdareya Koçberiyê ku di nav walîtiya wîlayetên ku hûn tê de heye, bikin. Hûn dikarin zanyariyên peywendiyê di malpera http://www.goc.gov.tr/icerik3/il-mudurlukleri-iletisim-bilgileri_362_371_5769 an jî di rehbera rûpela aliyê din de bibînin.

***Bicihkirina li Welatekê Sêyem***

Ew kesên ku ji derveyî Suriyê tên nav Tirkiyê, ji bo ku li welatekî sêyem werin bicihkirin dikarin dawakarî ji Komîseriya Bilind a Penaberan a Neteweyên Yekgirtî (UNCHR) bikin.
Ew dawakariyên ku li Tirkiyê ji UNCHR'yê were kirin, ji hêla Komeleya Hevkariya Bi Penaber û Koçberan Re tê wergirtin. Ji bo dawakariyê divê hûn herin ofîsa navendî ya vê komeleyê ya li Enqerê.

***Navnîşan: Taxa Aşağı Dikmen, Cadeya Galip Erdem. No: 42 Çankaya / Ankara***
**Telefon:** *03124275583 / 03122126012*
**Fax:** *03122126014*
**E-mail:** *sgdd@sgdd.org.tr*

Eger we, ji bo ku hûn li welatekê sêyem ji derveyî Tirkiyê û welatê ku hûn jê hatin werin bicihkirin dawakariya penaberiyê kiribe divê hûn li wê wîlayeta ku **İdareya Koçberiyê** destnîşan kiriye, bimînin.
**Li wîlayeta ku İdareya Koçberiyê ji bo mayîna we destnîşan kiriye:**

- Hûn dikarin ji nexweşxaneyên dewletî û xizmetguzariyên **tendirustiyê** beleş sûd bigirin.
- Hûn dikarin ji saziyên **perwerdehiyê** yên ku girêdayî Wezareta Perwerdeya Neteweyî ne beleş xizmet werbigirin
- Eger hûn bi xwedîkarekî re peymana karkirinê daynin, bi rêya xwedîkar ve hûn dikarin dawakariya destûra **karkirinê** bikin û sûd ji mafên ew**lekariya civakî** bigirin.
- Hûn dikarin ji derfetên **alîkariya mirovî û civakî** yên mîna mayîn, xwarin, kinc û cilûberg û piştgiriya psîko-sosyal sûd bigirin.

# Surîyeyîyên ku li Tirkiyeyê di Parastina Wextî de ne

Hemû penaberên Suriyeyî yên ku ji Suriyê ve ketine Tirkiyê di statuya **Parastina Wextî ya Penaberên Suriyeyê** de ne. Maf û azadiyên penaberên Suriyeyî yên ku di statuya parastina wextî de ne bi Telîmatnameya Parastina Wextî ya bi hejmara 2014/6883 ve hatiye danîn.

**Baldarî!:** Ji bo ku sûd ji maf û azadiyên xwe yên ku di Telîmatnameya Parastina Wextî de hatine destnîşankirin, werbigirin, **divê hûn di İdareya Koçberiyê ya Rêveberiya Wîlayetê de xwe qeyd bikin.**

Eger hûn hatibin qeydkirin:

- Hûn dikarin ji nexweşxaneyên dewletî û xizmetguzariyên **tendirustiyê** beleş sûd bigirin.
- Hûn dikarin ji saziyên **perwerdehiyê** yên ku girêdayî Wezareta Perwerdeya Neteweyî ne beleş xizmet werbigirin
- Eger hûn bi xwedîkarekî re peymana karkirinê daynin, bi rêya xwedîkar ve hûn dikarin dawakariya destûra **karkirinê** bikin û sûd ji mafên ew**lekariya civakî** bigirin.
- Hûn dikarin ji derfetên **alîkariya mirovî û civakî** yên mîna mayîn, xwarin, kinc û cilûberg û piştgiriya psîko-sosyal sûd bigirin.




**Baldarî! Hişyarî Ji Bo Hemû Penaberan:**
Teqez rê û rêbazên yasayî bi kar bînin. Peywendî bi qaçaxçiyên mirovan re daneynin. Qaçaxçiyên ku ji bo berjewendiyên xwe yên madî can û malê we û yê malbata we naparêze, berevajî dixe metirsiyê. Her wisa ji wî welatê ku hûn ê biçin hûn dikarin paşve werin vegerandin. Di vê rêwîtiyê de metirsiya mirin û birîndarbûnê gelek zêde ye.

# Zanyariyên Sûdewar ji bo Pênaberên li Tirkiyeyê

Hûn bi xêr hatin Tirkiyê…
Ev rêbera ku di destê we de ye derheqê çarçoveya hiquqî, **maf û azadiyên we** ya dema mayîna we ya li Tirkiyê zanyariyê dide. Her wisa zanyariyên peywendiyê yên saziyên dewletî û rêxistinên civaka medenî ya li **Hatay, Kîlîs, Eyntab, Ruha, Mêrdîn, Amed û Elihê** ku hûn dikarin alîkarî jê bigirin di vê rêberê de heye.




Em dizanin ku dema ku hûn li Tirkiyê dijîn li rastî hin pirsgirêk û muşkuleyan tên û hewcedariya we bi hin tiştan dibe. Çi mixabin em wekî rêxistineke biçûk a civaka medenî ne xwedî wê çavkanî û rayeyê ne ku bikarin hemû pirsgirêkên we çareser bikin. Lê belê me xwest em di vê rêberê de derheqê çarçoveya resmî û yasayî ya we, derfet û piştgiriyên pratîk û rêgiriyên ku ji bo we hatine danîn ji we re bêjin.

Em hêvî dikin ku ev zanyariyên ku di vê rêberê de hene alîkariya we bike da ku hûn bikarin pirsgirêkên xwe çareser bikin, jiyana xwe hêsantir bikin, maf û azadiyên xwe biparêzin.

Em ji bo aştî û selametiyê hêve dikin.

HELSINKI CITIZENS ASSEMBLY
HELSİNKİ YURTTAŞLAR DERNEĞİ

*Ev rênîşandere hatiye bi piştgiriya ku ji balyozxaneya Îngilîstanê hatine amade kirin.*